

## Çawa encamên têsta xwe ya COVID-19 wergirî

Sê rê hene ku hûn dikarin encama têsta xw ya COVID-19 wergirin:

1. Bi koda QR ya kesane
2. Bi rêya Encamên Portel
3. Bi rêya peyameke SMS ji tîlefona we ya destan re tê şandin

### Piştî têsta we, pêwîst hûn xwe îzole bikin ta ku hûn encama xwe werdigirin.

- Heta ku ji aliyê tenduristîya NSW ve bi awayekî din neyên şîretkirin, rasterast biçin mal û xwe îzol bikin.
- Li mal bimîne heta ku tu encama xwe werdigirî, tev ku tu bi nexweşiyê hest nakî.
- Pir kes di nav 24 saetan de encama xwe werdigirin.

### Vebijêrk 1: Koda QR ya kesane

Heke belavokek di dema têtstkirinê de dan we ku koda QR ya kesane (nav we û roja we ya jidayikbûnê di bin de), ji kerema xwe vê koda QR bi kameraya telefona xwe ya mobîl bigirin û bişînin kebis bike.

Ev koda QR hûrgilîyên we yê şexsî dihewîne. Nikare ji aliyê kesekî din ve bê bikaranîn.

### Vebijêrk 2: Encamên Portele Serhêl

- Serî li <https://my.pathology.health.nsw.gov.au> xîne.
- Dê ji we were xwestin ku hûn jimara tîlefona xwe ya destan binivîsin û dû re li ser bişkoka şîn bitikînin. BALA XWE BIDIN koda welêt dibêje +61 ew ji bo Australya ye. Heke hûn tîlefoneke navneteweyî bikar tînin, pêwîste hûn koda +61 biguhêrin koda ew welatê hûn lê dimînin.
- Dê kodek ji tîlefona we ya destan re were şandin. Vê kodê li ser malperra ku tede dibêje 'paskod' binivîse paşê li ser bişkoka şîn bitikîne.

TÊBINÎ: Eger ev cara yekeme tu serî li malperra serhêl ya Encamên Portel dixî, pêwîstî bi hin zanyariyên zêdetir heye.

Li ser 'Dîtina Encaman' bitikîne û divê van binivîsin:

- Navê pêşîn
- Navê dawî
- Roja jidayikbûnê
- Kodaposta mala te
- Zayenda te – mînak, nêr yan mê yan jî yê din
- Roja berhevkirinê – ev roja ku te têsta xwe kiriye
- Hejmara karta Medicare heke te hebe. Heke nîna vala bihêle.

- Li ser bişkoka şîn ya li jor ku dibêje, 'Navenda berhevkerinê hilbijêrin' bitikîne û li cîhê we têsta COVID-19 lê kiriye hilbjêre. Herweha navendên ku ji hêla Tenduristiya NSW tene birêvebirin ku navendên serbixwe jî tede. Ger hûn cîhekî ku ji hêla NSW Health Pathology nayê rêvebirin, ev malper dê zanyariyan bide we ka mirov çawa ji bo encama xwe têkilî bi klînîkê re bike.
- Ji bo dîtina encama xwe, li ser 'Dîtina Encaman' bitikînin.
- Dê ji we were xwestin ku nav û roja jidayikbûna xwe wekî RMMSSSS binivîsin, mînak, 01051971
- Hûn ê bikaribin xwe bigihînin kopiyeke ji encama têsta xwe ya COVID.

### Vebijêr 3: Wergirtina SMS

Ger hûn nikaribin xwe bigihînin encamên portela serhêlê, hûn dikarin encama xwe bi SMS ji têlefona xwe ya destan werbigirin.

- Van peyvên bişînin encama min 'my result' ji 0480 050 030
- Dema tê xwestin, ji kerema xwe zanyariya SMS bişînin:
  - Navê dawîn.
  - Roja jidayikbûnê wek – RMMSSSS. Mînak, 01012000
  - Heke tu zaroyekî qedyd dikî ye, dê delîlên ku tu dê yan bavê zaroyî yan jî wekîlî ji te were xwestin û gelo we maf heye hûn beryareke tenduristiyê ji bo zarokî bidin. Ji bo piştrastkirinê binivîse Erê.
  - Zayenda xwe wek N ji bo Nêr, M ji bo Mê yan jî O ji bo yê din.
  - Postkoda xwe, (mînak 2114)
  - Roja te têsta COVID-19 kirî wek RMMSSSS, mînak, 01052021
- Hûngilîyên xwe kontrol bikin û heke rast bin peyva Erê binivîsin. Heke te xeletîyek kiribe, ji bo ku tu ji nû ve dest pê bikî Na binivîse.
- Dema ku hûn qediyên ê mesajeke ku dibêje, '**qeyda we hatiye wergirtin**' (**'Your registration has been received'**).
- Herweha ji bo ku hûn encama xwe bistînin dê paskodek ji we re were ku divê hûn binivîsin.
- Dema encama we amade bû, dê peyameke SMS ji we re bê û peyva 'Amade' û paskoda xwe binivîsin.
- Encam dê were ser telefona we

### Hewceya te bi alîkariyê heye?

Heke te pirsgirêk ji bo wergirtina encamê hene û ji 48 saetan zêdetir derbas bûn, serî li malperra me xîne <https://www.pathology.health.nsw.gov.au/covid-19-info/covid-19-results-direct>

### Ger encama testa min nîşan bide ku min COVID-19 heye çi dibe?

Ger têsta we nîşan bide ku we COVID-19 heye, û we xwe qeyd kiriye ku hûn encama xwe bi yek ji van vebijarkan werbigirin, dê SMSek ji we re were ku encama we bi rêya Encama Portel amadeye, ligel bêtir agahdarî derbarê xwe-îzolkirinê.

Her weha karmendên tîmê Tenduristiya Gîştî ya herêmî ê bi we re têkilîyê deynin.

**DAXUYANIYA BERHEVKIRINA TAYBETMEND:** Patholojiya Tenduristia NSW ji bo mebestên agahdarkirina nexweşan ji encamên têsta COVID-19 agahdariyê berhev dike. Ev agahdarî dê bi gelemperî di hundir Tenduristiya NSW de were bikar anîn lê dibe ku ew ji ServiceNSW re jî ji bo mebestên agahdarkirina encaman were eşkere kirin. Mafê qanûnî yê kesan heye ku xwe bighînin agahdarian ku saziyeke hukumetê li ser wan werdigire. Ji bo bêtir agahdarî biçin [www.pathology.health.nsw.gov.au/about-us/privacy](http://www.pathology.health.nsw.gov.au/about-us/privacy). Encamên pêkan yên kesên ku hemî, yan beşek, agahdariyên ku têne xwestin nadin, dibe ku bibe sedem ku NSWHP nikare encamên têstê ji nexweşan re peyda bike.